Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(71) Berçele 2006 z~2618 k Buha (15) p.s

D a x u y a n î

Derdora demjêr 7ê êvarî 20/12/2006an, mamostê **Mihyedîn Şêx Alî**- sekreterê partiya yekîtî ya demokrat a kurd li Sûriyê(YEKÎTÎ), ji çayxana NEXÎL ya nêzîkî taxa Mehta Bexdad, ji bal dezgeha ewlekariya leşkerî ve hate girtin û ew birin cihekî ne diyar, ta niha rewşa wî ne diyar e.

Em vî şêweyê girtina hovane protesto û şermezar dikin, daxwaza serbest berdana wî yekser dikin, herweha, em dixwazin ev girtinên tersî zagona Sûriyê û zagonên navnetewî bêne rawestan, ev girtinên ku mafên nerîn û derberînê tune dikin.

Di nerîna me de, armanc û mebesta rijêma Sûriyê ji vê girtinê terorkirina xebatkarên gelê me yê kurd li Sûriyê ye, da ku wan ji vîn û xebata netewî dagerînin û çavên gelê me bişkînin, armancên gelê me di avakirina welatekî azad û serbest de ku cihê zordestî û cudahiya netewî têde tune be ji holê rakin.

Em bang li hemî alêgirên azadiyê û piştgirên doza gelan û mafên mirovan, hêzên demokrat û welatparêz dikin ku dengên xwe dij vî karê ne mirovane bilind bikin, kar û xebatê ji bo serbest berdana hevalê me Mihyedîn Şêx Alî bikin, aramiyê li dost, kes û hevalên wî vegerînin

- Azadî ji heval Mihyedîn Şêx Alî re!

- Azadî ji hemî girtiyên nerîn û derberînê di zindanên rijêma Sûriyê de re!

Komîta rêzanî ya
Partiya yekîtî ya demokrat a kurd li Sûriyê

20/12/2006